Şehîd Êhsan Fetahiyan: Qazî Mihemedê vê sedsalê ye!

Kakşar Oremar
Email: kakshar_oremar@yahoo.de

Kes nizane wê şeva reş stemkar û cinayetkaran Êhsanê qehreman bi çi awayî îdam kirin. Ji xeynî tîma îdamê kes agehdar nîne ka di wan çaxên hesas da Êhsanê evîndarê Kurd û Kurdistanê çawa li hemberî celadên Tehranê axiviye û çi gotiye. Xweziya zimanê der û dîwarên zindana Sine hebûya ka yê çawa behsa wê şeva reş bikirana û tabloyê berxwedana Êhsan Fetahiyan çawa dixemilandin.

Xeber pir nexweş û hemû hewldanên raya giştî, saziyên sivîl û Kurdên cîhanê nekarîn Îranê razî bikin ku ji ya xwe bê xwarê. Ev karê hovane baştirîn belgeye ji bo baştir nasandina nasnama **„komara wehşet“** û **„sîstemeke totalîter“**.

Hemû guneha Êhsan ew bû ku endamê Komelê bû. Di ti zagûnekê da nehatiye dîtin ku karekî wiha bibe sedema bidawîanîna jiyana kesekî/ê. Di orfa siyasî û hiqûqî da kesek bi tawana endametiya di rêxistineke siyasî da nayê îdam kirin.

Nameya Êhsan û naveroka wê ya tejî mesajên siyasî-dîrokî ti rêyeke din li ber dagîrkerên ecem nehiştibû. Nameya ku dikare weke **„wesiyetnameya qehremanekî“** bê bi navkirin. Tenê gotin û nêrînên Êhsan di vê namê da besin an jî dihêlin ku em wî weke **„sembol û qehremanekî millî“** binav bikin. Nameya ku dilê rayedarên Îranî lerzand û felsefa wan ya poç û vala qenctir bi hemû kesên xwedî wijdan ra da nasandin. Rayedarên dewleta Îranê xwedî cesareteke wiha mezin û exlaqî nînin ku şêre xurtekî weke wî azad biken an jî hukimê îdama wî îbtal biken.
Nameya Êhsan „**manîfestoyeke nû**“ye bo me hemû Kurda bi gişt û dengekî bilinde ji bo tirsandina hikûmeta nameşrûa Îranê di van 30 salên derbasbûyî da.

Bihara sala 1947an bû. Dadgeheke leşkerî li Mehabadê Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî mehkeme dikirin, lê Qazî Mihemed bû ku

rejîma şahenşahî û generalên rûniştî li wira mehkeme dikirin. Ew tev bûn yek û pêşewayê Kurd jî bi tena serê xwe wisa axivî ku hemû sûsretgirtî mabûn. Wesiyetnama Pêşewa Qazî û nameya Êhsan vê rastiyê ji me ra didin îspatkirin ku Êhsan xwîndevanekî mekteba Qazî ye. Êhsan bi têgehiştin, sewya bilinda rewşenbîrî, dûrbînî û kobra xwe ya bilind bû Qazî Mihemedê vê sedsalê. Ji ber wê jî Êhsan weke Mezlum Doxan, Leyla Qasim, şehîd Aram, Kemal Pîr û hwd bû sembol û qehremanekî millî. Şeref û serbilindiyeke wiha jî zû-zû di jiyaneke wiha kurt da nabe para herkesî.

Şehîdkirina Ê. Fetahiyan careke din çend rastî û heqîqetên dîrokî ji mera eşkera kirin:

1. Dîktator û hikûmetên totalîter hertim bi tirseke mezin li beranberî îrade û daxwazên gelên bindest tev digerin. Ew weke kondê şevên tarî reşbîn û ji her tişekî ditirsin. Ew xwe ji ronahî û rastiyên obcektiv vedişêrin û vedidizin. Îdam û kuştina azadîxwazan çi sûdek nabe bo dirêjiya temenê **„komara wehşetê“**, berevajî wê gel û dijberên vê sîstemê zêdetir û bi cesaretir dikevin.

2. Ji me Kurdan re bêhurmetiya herî dawî ji hêla dewleta Îranê mesajeke gelek watedar bû: Dema em xwedî kiyan an jî hêlîneke serbixwe nebin, jiyana me jî yê wiha erzan be.

3. Nasnameya siyasî û ramanên girtiyên sîyasî li rojhelatê Kurdistanê xaleke hevpar têda ye: Ew tev ji bo mafê Kurd û çereserkirina pirsgirêka Kurd hewl didin. Êca ger wihaye bila Kurd û rêxistinên siyasî li R.Kurdistanê tev hev û din bigirin. Bila ji şîret û gotinên Êhsan şermê biken û dest ji dubendî û netifaqiyê berden. Îro roj ne ya ji hev veqetînê, belkî dem û çaxa hevgirtinê ye.

4. Hemû dinya li dijî îdama Êhsan bû, lê vî karê rayedarên komara qaşo îslamî kakilê qanûn û zagûnên hikumeteke îslamî jî ji mere eşkere kirin. „Îslam“ek ku divê di hemû zagûnên wê da reformên bingehîn bêne durist kirin.

5. Îdama Êhsan weke êntiqam û tehqîreke mezin bû li dijî hemû Kurda. Çimkî dadgeha yekê ew bi 10 sala mehkum kiribûn, lê dema ku wî li hemberî daxwazên wan yên nemeşrûi li berxwe da û nekarîn bi darê zorê wî bînin ser rêya xwe, jêra gotin**:“ ger wa nekî, emê te îdam bikin…“**

6. Bav, dê û malbata Êhsan gere bizanin ku ew tenê kurê wan nîne, belkî bi karekî wiha re bû qehremanekî netewî û dîrokeke tejî serbilindî. Wî rêyeke nû li bere me vekir ku hemen rêya Qazî Meihemed e.
Kurê dayika şîr helal Êhsan tenê ji me dixwazek heye:**“ Tola xwîna min ji cinayetkarên vê sedsalê bistînîn…“**